

Nameyek ji kek Riza Çolpan ê Dêrsimî

Riza Çolpan ê Dêrsimî

Roj baş Kek Newaf! 16-1-2012 23-05 PM

Gelek spas jibo e-maîlkirina te ya Newroz. Bawer bike gelek kêsxweş bûm, lê hûn di nivîsa min da hin peyvyan diguhêrînin, wek xwe dinivîsînin, ku ev jî jibo nivîskar ne tevgerek xweş e. Mînak: we gîşt kirîye "Giş" piştî û we bêhnok danîye; li milê dî ez di cîyê "De" da "Da" dibêjim, we kirîye "De". Min gotîye "Mistê Kor" we kirîye "Mistê Kûr" di cîyê "Pûmê kor" -jibo kund- we kirîye "Bûmê kûr.

Herwaha kekê can, hêvî dikim hûn min şaş fêm nekin, ez ne zimanzan im, lê ez dixwazim wek xwe binivîsînim, ta



ku zimanê me yê yekgirtî çêbibe. Zimanê Hawarê li gor bawerîya min tenê bi zara Botan hatîye amadekirin, ku ev jî kêmasîyek e, divê em bipejirînin. Di hemû cîhanê da ziman li gor şert û şûrtên jîyanek nûjen tên guhartin. Gelek heval, gelek nivîskar "Celadet Bedîrxan usa nivîsîye, divê em jî wek wî binivîsînin" dibêjin, lê dîsa li gor bawerîya ev gotin û xoşmê jî Mantîq- şaş e. Wî kalikê me bingeha rêziman xweş danîye, lê di ware hemû zaravên zimanê Kurdî da kêmasî hene, divê zimanzanên Kurd van kêmasîyan dîsa bi navê wî gorbihîştî serast bikin. Dûra divê em ji xoşmêjîya demînbûnê, ango fanatîzmê dîr bisekinin. Her tişt tê guhartin, divê were guhartin ku bersîva şert û şûrtên demê bide. Heqê me tune em zimanê Hawarê wek îslamên hoyandinoki bikin eyatên quranê, bibêjin "Zimanê hawarê nay guhartin".

Birayê minê delal û xoşewîst, hêvî dikim tu min şaş fêm nekî, ev rexneyên biratîyêne.

Carek dî bi dil û can ji te ra hezar carî spas. Têm çavên te û herdu xortan maç dikim, ji xuşka xwe ra silavên biratî redîkim. Ji hemû nasan ra silavên min bêje. Mahfûze û zarokên wê baş in, gîşt gelek jîr û bihiş in, dixwînin. têbinî:

Li wir, ango li Sûrîye rewş di çî encamê da ye, ji kerema xwe min ra bi kurtî binivîsîne. Bimîne di xweşîyê da. Rizo yê Dersimî.

Dumahîk: **Nameya Kek Îbrahîm...**

Şêhîdbûna Dr. Şêzad hîç şik tune ye ku hemû milletên kurd xemgîn kir.

Ez û malbata min jî gelek xemgîn bûn.

Şêhîdbûna Dr. Şêzad dîsa bû wesîle ku ez/em xwînxwarî û barbarîya rejîma baasê ya dîktator û kolonyalîst nas bikin û li hemberî ev rêjîma ne mirovane şer bikin.

Kurdistan û milletê kurd yek e, ji aliyê dewletên metîngehkar/kolonyalîst de bi Peymana Lozanê hat parçe kirin. Divê em kurd li her beşê Kurdîstanê dest û mil bidin hev. Lewra berjewendîya kurdên hemû beşan hevbeş e. Li Beşa Başurê-Rojavayê Kurdîstanê azadî û desthilatdarî, bi wateyek desthilatdariya beşê din e.

Ez ji bona malbat û hevalên Dr. Şêzad û meiletê me yê kurd ser saxî dixwazim.

Xwedê sebir bide malbat û hevalên wî.

Divê ku em ji xebat û têkoşîna wî re xwedî derkevin.

Bimînin di xêr û xweşîyê de.

Amed/Bakurê Kurdistanê

Birayê We Îbrahîm GUÇLU